

BILBIL

H.C. ANDERSEN

Թարգմանաւոր Հազմի Կիւի



Hans Reitzels Forlag

designating only the former Tatars, the Azeris. The indigenous ethnic groups who survived Turkification became minorities. In addition to the Armenians we cite the Udis, probable descendants of the ancient Albanians who still numbered several thousand in northern Azerbaijan until 1988; the Kurds who were numerous in Karabagh and who number several tens of thousands even if they are no longer enumerated by the official census;²¹³ the Tats, an Iranian ethnic group numbering 20,000 in the north-east of the republic; and, finally, the Talish, another Iranian group whose language, forbidden, is related to the old Iranian Azeri and who number several tens of thousands in the south-east of the republic, in the vicinity of Lenkoran.

At one time or another these lands had been controlled by the khans. Then they were included in the Russian guberniias of Elisavetpol or Baku. Now, independently of the ethno-cultural identity of their populations, all these territories were proclaimed Azerbaijan, the term applied in a collective ethnonymic sense, and this was the case for Mountainous Karabagh as well. The term 'Azerbaijani' began to be applied to the cultural heritage of these regions, merging the Moslem heritage and, for the past twenty or thirty years, the prior and neighbouring legacies of Albania and the Armenian provinces.

A Brief Survey of Art History

The art created in Artsakh or Khachen constitutes one of the important chapters in the history of Armenian art, from which it cannot be dissociated. It has progressed through the same major stages from the adoption of Christianity early in the fourth century through to the end of the Middle Ages and on to the nineteenth century. As in the rest of Armenia, the principal expression of this medieval art has been ecclesiastical architecture.²¹⁴ Numerous monuments, chapels, churches, and monastic complexes are preserved despite the total absence of maintenance over the past seventy years (those in the Autonomous Region of Mountainous Karabagh represent only a small part of this architectural legacy). Works in Karabagh obey the same plans and are built according to the same techniques as those in the rest of the country.

Volcanic rock is the principal material. Mixed with lime, it forms the nucleus for the walls which are then covered with facing. The exterior facing can consist of carefully cut blocks for the large buildings in cities or in monasteries such as Gandzasar. But it was also common practice, as in several outlying provinces, to use stone less carefully cut for more modest structures, creating a more rustic appearance. The inscriptions on these façades appear exclusively in the Armenian language and often provide precise dating, the names of the patrons, and sometimes even the name of the architect.²¹⁵

There are several monuments which have come down to us from the paleo-

Christian period and from the early Middle Ages. Among them is the type of martyrion represented at Amaras (Martuni District) by the mausoleum of St Grigoris (489): a vaulted burial chamber equipped with two lateral vestibules which serves as the crypt for a church dating from a later period. Several chapels from this period consist of simple vaulted rooms (single nave) with an apse on the east sometimes flanked by two small rooms (Targmanchats near Dashkesan, probably fifth century). The basilica at Tsitsernavank in the Lachin District (probably fifth or sixth century) is the best-preserved example in Armenia of a basilica with three naves.²¹⁶ Churches with a cupola built on a radiating or cruciform floor plan were numerous in the rest of Armenia during the seventh century and are as well represented in Karabagh: the chapel at Vankasar (Aghdam District, seventh century), where the cupola and its drum rest on the central square of a cruciform floor plan; Okhte Drni (Hadrut District, probably fifth to seventh centuries) with roughly cut and bonded walls enclosing a quatrefoil interior with four small diagonal niches. We note, however, that certain plans frequently employed in other regions of Armenia during the seventh century are not, to our knowledge, found here. These include the chamber with a cupola supported by wall braces (Aruj), the cruciform plan with a cupola on four free-standing pillars (St Gayane), the radiating type with four rooms in a rectangle (St Hripsime).


Curiously, few of the monuments are precisely dated from the post-Arab period and that of the kingdoms (ninth to the eleventh centuries), very productive periods in the other Armenian provinces. The structures we can place in this period are chapels on the cruciform plan with a cupola (Varazgom, Lachin District, and Khunisavank, Gedabek District) and churches with a single nave (Poladlu and Parissos, Gedabek District).

On the other hand, during the post-Seljuk period and the beginning of the Mongol period (end of the twelfth, and the thirteenth century), architecture flourished, especially in the construction of monasteries. These were the active centres of culture and art, with their scriptoria where manuscripts were copied and illuminated. They also served as refuges for the population and were always fortified. Churches with a single nave continued to be constructed in numbers. At the monastery of Yeghishe Arakyal or Jervechtk, Martakert District, we find eight single-naved chapels aligned from north to south. Less common is the type of free cross plan with a cupola found in the Chapel of St Saviour in the Martakert District. Several monastic churches of the thirteenth century adopted the model used most widely throughout the country: the church with a cupola, in the inscribed cross plan with two or four angular rooms. This is the case for the monasteries at Dadivank (1214), Gandzasar (1216–1238), and Gtichavank (1241–1246). In the case of the two latter churches, the cone over the cupola is umbrella-shaped, a picturesque form widespread in Armenia from the eleventh century on.

Institut kurde de Paris

Ji xanîna kija
Joyce Blau ra--
H. M. B.
12.4.90

Institut kurde de Paris



Liv. 7752



Institut kurde de Paris

Çîrokên
H. C. ANDERSEN

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Çîrokên

H. C. ANDERSEN

Kurdîya wê: Hazım KILIÇ

Wêne: Vilhelm Pedersen

Hans Reitzels Forlag

Bilbil - H.C. ANDERSEN

© Hazım KILIÇ & Hans Reitzels Forlag A/S, København 1989

Dronningens Tværgade 5, DK-1302 Copenhagen K

Trykt hos Narayana Press, Gylling

Tîprêzî: Weşanxana Xanî & Bateyî

Çapa Yekemîn: Teşrîn 1989 (November)

Printed in Denmark 1989

ISBN 87-412-4201-7

Spasî

Ev pirtûke, bi rênişaniya Merkeza H. C. ANDERSEN û bi hevkarîya Fona Neil Pascoe, Komîta piştgirîya çapa pirtûkên zaroka yê bi zimanên biyanî û Wezareta Çandî ya Danmark'ê hate çap kirin. Ez ji dil spasî wan dikim.

Hazım KILIÇ

Udgivet med støtte fra Kulturministeriet,
Neil Pascoe's Fond og
Komiteen til uddeling af støtte til børne-
og ungdomslitteratur.
Desuden har H. C. ANDERSEN Centret
været konsulteret.

NAVEROK

Pêşgotin 7

Xewda 9

Prensese Rastî 21

Keça Tilîn 23

Leşkerê Risas Yê Egît 33

Bilbil 38

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Hans Christian ANDERSEN

H. C. ANDERSEN di sala 1805-a da li Danmark'ê, bajêrê Odense hate dinyayê. Di sala 1875-ê da jî li serbajêrê Danmark'ê, Kopenhag'ê mir.

ANDERSEN, kurê malbateke xîzan bû. Babê wî pêlav-çêker bû. Di yazdeh salîya xwe da êtîm ma. Di karên cûre cûre da xebitî. Pirtûka xwe ya yekemîn di sih salîya xwe da nivîsî û li Kopenhag'ê weşand.

Nivîskarê navdar H. C. ANDERSEN, helbest û roman jî nivîsîne. Lê belê wî giranî daye çîrokên zaroka. Ji ber vê yekê jî ew di timamî dinyayê da wekî babê çîrokê tête naskirin. Çîrokên wî bi gelek zimana hatîne weşandin. ANDERSEN di çîrokên xwe da; ji nava dilê zaroka dinêre bûyera û dinyayê. Ew di çîrokên xwe da hem diramîne, hem jî dikenîne. Mirov dikare bêje; navika çîrokên wî evînî ye.

Eve cara yekemîn e ku pirtûkeke çîrokên wî bi zimanê me tête weşandin. Tenê çîrokeke wî ya bi navê "Keçika Kibrîtfiroş" di sala 1943'a da ji aliyê Bişarê Segman ve hatiye wergerandin û di kovara Ronahî'yê hejmara 19'a da bi kurmancî hatiye weşandin.

Di vê pirtûkê da pênc çîrokên H. C. ANDERSEN cih digrin. Hûn dê van çîroka, ku her yek ji ya dî xweştir e, bi zewqeke mezin bixwînin.

Adar 1989

Hazım KILIÇ

Institut kurde de Paris



Xewda

Di vê dinya mezin da kes temetî Xewda çîroka nizane û ji wî xwestir kes nikare çîroka bibêje.

Xewda pêlavên xwe bi şev derdêxe û li ser tilên pîyên xwe bi pêlekana ve diçe, dera bi qayde vedike; diçe nik zaroka û libkên xîzi li ser û rûyê wan direşîne. Ew çavên hûrik hema tên niqîn; lewma jî kes hatina Xewda nabîne.

Xewda dixwaze zarok bê deng bin; ji xwe zarok di xewê da bê deng in. Ne hatiye dîtîn ku wekî zarok hişyar, bê deng bin. Lê belê, çawa têkevin nav nivîna hema bê deng dibin; ji xwe bê deng nebin, nikarin çîrokên Xewda bibihîzin.

Wekî zarok di xew diçin, Xewda li rexê nivînê rûdine. Libasên bi reng berdike; çakêtê wî ji armîş e; rengê wî ne kivş e, li gor ronahîyê car kesk, car sor, car jî şîn dibe. Du sihwanên Xewda jî hene. Yek bi wêne ye; wê di timamî şevê da li ser zarokên baş û qenc vedike, daku xewnên spehî bibînin. Sihwana di jî reş e; wê jî li ser zarokên mizewir vedike. Zarokên mizewir jî heta spêdê qet xewna nabînin.

Xewda heftîya borî her şev çû nik zarokê bi navê Hîalmar. Ka em binêrin, wî kîjan çîrok jê ra gotin.



Duşemb

Xewda çawa Hîalmar razande ser cihî jê ra got, "niha guh bide min, binêre ezê çawa mezela te bixemilînim."

Hema di wê demê da kulîlkên di guldanka da hemû pêk ve mezin bûn. Bûne darên gir. Çeqên wan bi binbani ketin, belgên wan jî belavî ser dîwaran bûn. Mezel di carekê da bû wekî bîstanekê. Hemû alî bi kulîlkan ve dorpêç bûn. Ji gulê spehîtir bûn kulîlk, bi bêhtir bûn; mîna şekirê bi tam bûn. Ji çeqan mêweyên reng zêrîn dahelyan. Ya rastî, tişteki wisa ne hatibû dîtin heta wê rojê.

Ji nişkê ve jî dolapka masa Hîalmar û ji nav pirtûk û defterên wî nalînek hat bihîstin.

Xewda got; "Çi dibe?" Çû dolapka masê vekir. Çavê wî bi kaxezekê ket. Hindek hejmar li ser kaxezê bi lotka ketibûn. Çiku komkirin xelet hatibû çêkirin. Pênivîsê risas jî wekî kuçikê seyekî xwe dihilavêt, dixwest komkirinê serast bike lê jê nedihat. Piçek li wêdatir deftera Hîalmar hebû. Hindek tîp hatibûn nivîsîn li ser defterê.

Tîp Hîalmar nivîsibûn; lê ya rastî hûn bivên, gelek xirab nivîsibûn. Hemû xwahr û vîç bûn; heçku dê ji rêzan bikevtina.

Tîpên ku li serê defterê hatine nivîsîn digotine tîpên ku

Hîalmar nivîsî, "komî serhev bibin, bixebitin ku hûn mîna me lê bên."

Tîpên ku Hîalmar nivîsî jî bi gazindî digotin, "em dixebitin, lê ji me nayê."


Xewda got, "Çik bisekinin. Gavek zûtir bi serxwe ve werin, li qencbûna xwe binêrin; heke ez'ê gazî doktori bikim û we bidim derzî kirin."

Dema tîpa guh li derzîyê bûn bi qîjînê ketin; û bi lez xwe serast kirin û ketin rêzê.

Xewda got, "Dîyar bû ku îşev ez nikarim ji we ra çîroka bibêjim. Divê ez tîpa bixebitînim."

Paşê bi qêrîn go, "Çep! Rast! Çep! Rast!" û tîp demekî dirêj dane xebitandin û ew kirin rêz. Dawîyê hemû wekî tîpên ku li serê defterê hatibûn nivîsîn wisa lê hatin.

Lê belê Hîalmar dema spêdê şîyar bû dît ku ew tîpên rast nivîsî dîsa wekî berê xwahr û vîç bûne.



Sêşemb

Hîalmar ku di xew çû, Xewda çovê xwe yê sêhrî li ser tiştên nav mezelê gerand. Tişt hemû bi ziman ketin jî nişkê ve. Hemûya behsê xwe dikir. Tenê tifa li quncikê mezelê nedixift û bi heyrî guhdariya metihdana tiştên dî dikir.

Tabloyeke mezin di nav çarçoveyê birisqok da li ser

dolaþa cila bû. Di tabloyê da darên kesk û şîn, kulîlkên di nav gîya da vebûy û herikîna çemekê dihate dîtîn.

Xewda çovê xwe yê sêhrî li ser tabloyê gerand. Ji nişkê ve çivîk wîçîn, çeqên dara hejîyan û ewirên esman livîyan.

Xewda, Hîalmar'ê pîçûk rakir danî ser tabloyê li nav gîyayê bi bejn. Hîalmar bezî lêva çemî û xwe avête nav keleka sor ya ku di nav çemi da. Wê demê şeş kuxu diyar bûn di nav çemi da; di stûyê wan yên dirêj da çelengên zêrîn, di serê wan da stêrkên şîn î biriqî hebûn. Kelek kêşane ber kozikekê. Darên li kozikê, çîrokên li ser rêbir û sêhredara digotin.

Kulîlkan jî behsê perîya dikir û helbestên ku sîsirka dixwendin, dubare dikirin.

Masîyên reng zîv û zêrîn li dûv kelekê meleyanî dikirin; carna jî xwe hildavêtin ser avê. Ava ku ji ber hilavêtina wan bilind dibû, bi ser serê Hîalmar diket. Çivîkên sor û şîn difirîn li esman, kulî dileyistin, kêzên tebaxê distran. Hemûya dixwest digel Hîalmar biçin; çîrokên ku jê ra bigotina hebûn.

Ev çi rêvingîyek xweş bû. Kozik car tarî dibûn, bi ber siyê diketin, car ronahî dibûn bi ber tîrên hetavê diketin. Qesrên bilind, kelên mermer bilind dibûn li her derê; prensesên bedew radiwestan li ser balkona. Hîalmar hemû prenses nas dikirin; hemû hevalên wî bûn. Çi leyiz, bi wan ra leyistibû. Dilekî ji şekirê çêkirî girtibûne destê xwe dirêjî Hîalmar dikirin. Hîalmar ji her dilekê nîvek jê vekir hilgirt. Bi vî tehrî nîveke dila li nik Hîalmar, nîv jî li nik prensesa ma.

Li ber derên qesra jî prensesên delal disekinîn. Di destên wan da şûrên zêrîn hebûn. Ji esman mewîj û leşkerên risas dibarîn.


Leşker rastî jî prens bûn. Hîalmar, car ji kozika, car ji qesra, car jî ji cihên kirîn-firotinê derbaz dibû. Dema ji çarsûyekê derbaz bû pîrika xwe ya berê dît. Pîrika wî çawa hejê dikir. Dest li Hîalmar hejand, bi kenîn lorîyek herî xweşik got:

"Hîalmar'ê delal, lawê min,
 Di xewnên min da her tu heyî,
 Ew çavên te yên şîn heyî,
 Pora te ji zerê zêrîn.

Cara yekem min destê xwe bi serê te da anî,
 Cara yekem min bihîst axiftina te,
 Cihê min ji melayketan ra ma,
 Di nav xweşîyê da bimîne, lawê min yê
 delal."

Çivîk ji bi wê ra lorîn, kulîlk pêk ve reqisîn, darên kevnare ji
 belgên xwe hejandin.

Xewda, ji wan ra jî çîrok gotin.



Çarşemb

Baran wisa dibarî heçku ji şûşê vedrijî. Hîalmar di xewê da jî
 dengê baranê dibihîst. Xewda pencere vekir. Golek xûya bû li
 ber derê malê. Keştîyeke delal ji hebû di golê da.

Xewda gote Hîalmar, "Tu dê digel min bêt? Em'ê biçine
 deverên bîyanî; hêj nebûye spêde ji tu dê vegeî."

Hîalmar libasê xwe yê herî bedew berkir û ber bi keştîyê ve
 bezî. Hewa ji nişkê ve vekir. Keştî ji kolanan derbaz bû û
 dakete nav derya bê ser û bin.

Li esman refeke leglega dîtin. Leglega koçi deverên germ dîkir; ji nav wan yekê wisa westa xûya dîkir ku perên xwe hema bi zor dadiweşandin. Li dawîya refê mabû. Perên xwe vekirin û daket, daket û dada ser stûna keştîyê. Ji westanê nikarî li wê derê jî xwe vegire, xwe berda ser mezela kaptan.

Hîalmar, leglege hilgirt û bir danî nav mirîşk, werdek û eleloka.

Mirîşka pêk ve dest bi qidînê kir. Bi qêrîn gotin, "Dê ka lê binêrine vê tişabeta gêj." Elok jî hilperîn û xwe gij kirin; werdek jî bi pelepêl çûn û bû waqîna wan jî.

Piştî şaşîya leglegê belav bû, destpêkir behsê Afrîka, pîramîda û teyrên hêştirî ji wan ra kir ku, ka çawa wekî hespên revdî dibezin. Werdeka jî gotinên wê qet tiştek têngihiştin: Dîsa dest bi waqînê kirin û gotin, eve çi tişabeta gêj e, ka lê binêrin!"

Ji eloka yekê bi dengê bilind go "Belê, hem jî gelege gêj e!"

Leglegê jî xwe bê deng kir û dest bi ramîna Afrîka kir.

Elokê gotê, "Laqên te rastî jî gelek bedew in, te mîtroya wan bi çendê kirî?"


Bu waqîna werdeka û pê kenîn. Leglegê qet xwe bi ser pirsê ve nebîr.

Elokê gotê, "Dê tu jî bikene. Rastî jî yarîyek pir xweş bû. Lê tu têngihiştîyî. Tu yeke ehmeqî. Dê ka em kêmekê ji xwe ra şahîyê bikin."

Mirîşka dîsa dest bi qidînê kir; elok dîsa hilperîn; werdek jî bi pelepêl virda-wêda bezîn.

Dema Hîalmar deng û dor bihîst ber bi lîs ve çû; derî vekir û gazî leglegê kir. Leglegê firda ser mezela kaptan. Êdî hêsa bibû. Her wekî spasî Hîalmar bike, serê xwe hejand. Paşê perên xwe vedan û firda. Yên di lîs da, ji tîrsa verevîn. Ji hêrsa hemû jî sor bûn.

Hîalmar go, "Ez'ê sibê we hemûya bikime şorbe!" Paşê hişyar bû. Xewda, wê şevê ew derêxistibû rêvingîyeke çawa ecêb!



Pêncşemb

Xewda go, "Newebî bitirsî, niha ez'ê mişkekî piçûk nişanî te bidim. Destê xwe dirêj kir û mista xwe vekir. "Îsev dawet heye. Du mişk dizewicin. Ev mişkê tu dibînî, hatiye te gazî ser dawetê bike. Di bin mezela xwarinê da rûdinin. Mala wan pir delal e."

Hîalmar go, "Ez nikarim li vê kunika piçûk bi cih bim." Xewda go, "Tu wî kari ji min ra bihêle. Bêhneke dî tu dê piçûk bî." Bi çovê xwe yê sêhrî palî Hîalmar kir. Hîalmar ji nişkê ve wekî tiliekê lêhat.

Xewda go, "Libasên leşkerê risas berbike. Gelek ji te tên."

Hîalmar go, "Bila." ; libasê leşkerê risas berkir.

Rastî jî gelek jêhatî bibû.

Mişki go, "Niha rûne ser sindoqa dîya xwe, ez te bibime dawetê."

Hîalmar rûnişte ser sindoqa dîya xwe. Mişkê piçûk sindoq wekî erebê rakêşa û Hîalmar bire ber derê ku dawet lê.

Dema ji kunika piçûk derbazdibûn Hîalmar pirsî, "Çi bêhneke xweş ji vê derê têt, ne wisa ye?" Bêhna penîr ji hindûr dihat. Mişki go, Eve, bêhna herî xweş e di dinyayê da."

Di mezela rûniştinê da mişkên mê li alîyê rastê bibûne rêz; pir bi keyf bûn. Mişkên nêr jî li alîyê çepê, simbêl badidan. Penîrekî mezin di holê da bû. Bûk û zava xûya bûn ji kunikên penîr. Hev û du maç kirin.

Wê şevê mişka têr penîr xwar. Wekî şirînî jî serê mişkekê

polikek anîn. Li ser her polikekê seretîpên navên bûk û zavayi hatibûn nivîsîn. Rastî eve nûvedîteke baş bû.

Her kesê behsê xweş derbazbûna dawetê dikir. Heta spêde têr keyfî bûn.

Piştî dawet xilas bû, Hîalmar vegerî mezela xwe. Gelekî şa bû ku hevalên nû ji xwe ra peyda kiribûn. Xwe di xwe da nedigirt. Wexta hind piçûk nebûba wekî libasê leşkerê risas berkirî dê hêj şatir biba.



În (Eynî)

Hîalmar pirsî, "em ê îşev çi bikin?"

Xewda go, "Tu dixwazî biçî daweteke dî? Ne mîna daweta dûhî ye. Du bebikên xwûska mezin dê şû bikin. Serda jî îro roja bûyîna wan e. Kî dizane ka wê çi dîyarîya ji wan ra bînin."

Wexta xwûska min ya mezin ji bebikên xwe ra libasa dikire an dibêje "roja bûyîna wan e" an jî "şû dikin". Heta niha belkî sed cara şû kirine."

Xewda go, "belê, îro cara sed û yekemîn e ku şû dikin. Ji bo vê çendê dê daweteke xweş bête pêkanîn."

Hîalmar berê xwe da masê, mala bebikê. Ronahî hebû di penceran da. Leşkerên risas li ber derî disekinîn.

Xewda libasên reş yê dapîra Hîalmar berkirin û bebik zewicandin. Piştî dawet xilas bû, tiştên di mezêlê da, strana pênivîsê risas nivîsî stran :

"Îro em gelekî şa ne
Ev çi dawetek delal e
Bûka me ya şîrîn
Pasta wê ya heft tebeq
Em bixwin sê bi sê tûzî
Bikenin em keyfê bikin."

Paşê dîyarî hatin dan; bûk û zava, tiştên xwarinê paşda vegerandin, gotin "evîniya me dê me xweyî bike."

Zava ji bûkê pirsî, "em biçine geştê? Heke tu bixwazî em dikarin biçin welatekî bîyanî jî."

Gazî qijika pir geryayî û mirîşka pênc nîş çûçik mezin kirî kirin. Qijikê behsê welatên germ û bedew, wûşiyên tirî, mêw û rêzeçiya kir.

Mirîşkê go, "Lê belê li wan welata kelemî nînin. Rojekê wexta ez li geştê digerîyam ketime nav kelemîya. Nikarim wan ji bîr bikim."

Qijikê bersiv da û go, "Kelemî li her welatî hene, serda jî êre pir bi baran e. Baran qet na sekine."

Mirîşkê go, "Ne sekine jî bila ne sekine."

"Hem bi baran, hem jî sar."

"Kelemî hej sermayê dîkin." û go, "bi ya min, tu rastîyê nabêjî."

Baran car car disekine. Ma te ji bîr kir ku berî çar sala li ser hev bi timamî pênc roja baran ne barî bû. Min jî rêvingî kir, rojekê bi timamî du kilomîtir çûme dûr. Qet tam tê da nîne. Çi heye di rêvingîyê da?"

Bûkê go, "Em'ê çi bikin bi dîtina deverên dî, em rûnine cihê xwe. Carna em'ê derkevin nav bîstani, li nav kelemîya bigerin."

Rîberiz jî bi vî tehrî xilas bû.



Şembî

Hîalmar'ê piçûk çawa bi xew ket go, "Tu dikarî ji min ra çirokekê bêjî?"

Xewda sihwana xwe ya bi wêne vekir û go, "Îşev çîrok nîne, ka binêre van mirova."

Sihwane mîna lalîkeke mezin ya Çînî bû. Li ser, darên şîn, pirên bi kemer û mirovkên piçûk hebûn.

Xewda go, "Sibê cejn e, divê ez her tiştê di dinyayê da bedew bikim. Pir karê min heye. Ez'ê biçim bi ba ra baxivim, bila toza li ser gîya û belga paqij bike..."

Ez'ê stêrka yek bi yek bînim xwarê û biriqînim. Di vê navberê da stêrka û kunikên di esman da divê ez nimre bikim. Paşê dibe ku ez wana li cihên xelet bi cih bikim. Heke stêrk jî li cihên xwe yên kevn qaîm ne sekinin wê bikevin."

Di wê demê da wêneyê bi dîwar ve hilawîstî, tevî axiftinê bû. Wêne, yê mirovekî pîr bû. Go, "Ka binêre min Xewda, ez bapîrê Hîalmar im. Tu çîrokên xweşik jî nevîyê min ra dibêjî, spas dikim. Lê belê behsê tiştên xelet jê ra neke. Stêrk nayên xwarê û biriqandin."

Xewda hêrs bû û go, "Ne lo? Erê tu bi emrî lê ez ji te bi emirtirim. Zêdetir tišta dizanim. Stêrk wisa jî têne biriqandin. Ez êdî têkil nabim. Tu çîroka jî nevîyê xwe ra bêje."

Paşê sihwana xwe hilgirt û çû.
Wêne şaş bû û go, "Barî kela! Ma azadîya axiftinê jî nîne?"
Aha tam di wê demê da Hîalmar şîyar bû.



Yekşemb

"Şev baş!" go Xewda.

Hîalmar, çawa dengê wî bihîst, ji cih hilfirî û wêneyê bi dîwar ve berepaş zivirand. Ditirsa ku Xewda dîsa biçe.

"Tu dikarî çîroka pênc polikên ku di kelûçkekê da dijîn, bêjî? An jî tu hez bikî çîroka şerê danê mirîşka bi çûçikan ra bêje."

Xewda go. "Her car tiştên xweşik nayên gotin. Îro ez'ê tişteki dî nîşanî te bidim. Ez'ê birayê xwe nîşanî te bidim. Birayê min tenê carekê tete dîtin ji aliyê her kesî ve. Biçe bal kê, ew wî hildigre li hespê xwe siwar dike û çîrokekê jê ra dibêje. Du çîroka dizane; ji çîroka yek pir xweş e, çîroka herî xweş e di dinyayê da; ya dî ecêb ku ecêb e."

Xewda Hîalmar'ê piçûk rakir bire ber pencerê gotê, "Ev e birayê min. Ji Xewda'yên duyê. Navekî wî yê dî jî mirin e. Di wêneyên pirtûkan da wî her wekî cendek çêdikin; lê va ye tu

dibînî, qet tîrsdar jî nîne. Libasê bi sûrme berkirîye, pelerînekî ji qedîfe jî le ser milên wî ye.

Binêre, çawa bi çargavkî jî diçe!”

Hîalmar, Xewda'yê duyemîn, mirin dît li dûraya. Ciwan û pîr li hespê xwe siwar dikirin. Mirinê; kesên baş yên ku hevkarîya wan gihîştîye kesên di li pêş xwe, yên xirab jî li paş xwe siwar dikirin. Ji bo yên li pêşîya xwe siwar kirî çîroka xwe ya xweş, bo yên li paş xwe siwar kirî jî çîroka xwe ya tîrsdar digot. Yên ku çîroka tîrsdar dibihîstin, direcifîn, digrîn û dixwestin xwe bavên xwarê. Lê belê nedikarîn; wekî bi hespi ve zeliqî bûn.

Hîalmar go,” Mirin, Xewdayekî pir baş bûye. Ez ji wî natirsim.”

Xewda bersiva wî da, ”Wekî, tu qencîyê li her kesî bikî, hevkarîya mirovên di bikî dê çima bitirsî?”


Bapîrê Hîalmar, ji dîwar ve tevî axiftinê bû û go, ”Rast e.”

Demekê hizirî û axiftina xwe domand:

”Heke azadiya axiftinê nebûya, ne te dikarî van bibêjî, ne jî nevîyê min dikarî fêrbibe.”

Evan e, çîrokên Xewda... Dibe ku, îşev bê ji we ra jî çîroka bibêje.





Prensese Rastîn

Bi salan berê Presek hebû. Vî prensî dixwest digel prensesekê lê belê digel prenseseke rastîn bizewice. Li timamî dinyayê geryabû lê yeke bi dilê xwe peyda nekiribû. Çiku ji prensesan qet yek jî ne rastîn bûn; hemû jî "paşê" bibûne prenses. Prens jî, bi dilekî şkestî vegeryabû qesra xwe.

Şevêkê firtoneke tirsdar peqîya, guregura esman e, birûsk diçeçin, baran herwekî jî şûşê vedrije wisa dibare. Derûdor jî nişkê ve di nav tarîyê da ma.

Axir, derîyê qesrê pir hêl hate qutan. Dîya Prens, Keyban çû derî veke.

Li derve prensesek radiwesta.

Pora wê ji ber baranê dawesiyabû ser milên wê, libasên wê jî bi laşê wê ve zeliqî bûn. Got ku ew prenseseke rastîn e.

Keybanê gotê, "Em'ê îşev bizanin ka tu prenseseke rastînî an ne. "Bi dizî ve çû mezela mêvana. Sê libkên piçûk yên polika danîn ser doşekê. Polik bi bîst çarşeva peçinîn. Bîst serdoşekên ji pûrtê çivîka çekirî jî danîn ser çarşeva.

Prensesê şeva xwe li ser wî cihî borand.

Spêdehîya di Keybanê jê pirsî, ka şeva xwe çawa borandîye.

Prensesê go, "Ax, min qet nikarî binivim. Min çavên xwe jî neniqandin. Heçku li binê wî cihî tiştek hebû. Piştî min perçifi."

Bi vî tehrî hat zanîn ku prenses, prenseseke rastîn e. Heke ne prenseseke rastîn bûya, qet gazind ji sê polikên di bin bîst serdoşekan da dikir?

Taliyê, tiştê ku lê digerîya dîtibû Prens. Dawetek mezin hat kirin. Sê polik jî rakirin mûzexana qesrê. Heke hêj ne hatibine dizîn, niha jî li wê derê ne.

Ev çîroke neku ji ber hatîye gotin; rastî jî bûye.





Keça Tilîn

Berya berê, jinek hebû ku zarokê wê nedibûn. Ev jine, rojekê çû nik sêhredarekê. Gotê, "Ez çend bixwazim jî zarokê min nabin. Tu bi aqilî. Bêje min, ez çi bikim ku zarokekî min bibe?"

Sêhredarê got, "Hêsan e. Niha ez'ê tovekê bidime te. Ev tove, ne di zevîyan da peyda dibe, ne jî çivîka xwarîye. Dê biçînî guldankeke û li hêvîyê bî."

Jinikê go, "spas dikim." Piştî perê tovi dayê çû mala xwe. Çawa çande guldankeke hema di nişkê da tov şîn bû. Mîna le'lê lê hat. Belgên wê hişke hişk girtîbûn. Jinikê got, "Çi kulîlkek delal e!" û ew belgên mîna zerê zêrîn maç kirin.

Li wê demê bû çirpîna le'lê û belg veda. Di nîvekê da keçeke piçûçik rûniştîbû. Bejna wê temetî tilîyeke destî bû; ji ber vê yekê jinekê jî navê wê danî Keça Tilîn.

Jinikê ji qelpika gûzê landikek delal jê ra çêkir. Keça Tilîn, şeva di nav binefşan da, di bin belgê gulekê da radiza, bi roj jî li belgeke mezin ya le'lê siwar dibû û di lalîkeke tijî av da digerîya. Rexên lalîkê bi wêneyên kulîlka ve hatibû

xemilandin. Keçik bi du bërkelekên ji mûyê dêla hespi, digeriya û bi dengê xwe yê mîna zengilê distra. Heta wê rojê dengê wisa xweş nehatibû bihîstin.

Şevêkê dema ku di cihê xwe da dinivist, ji pencera şkestî ve beqeke kirêt û gir kete hindûr. Xwe hilavêt ser masê. Ku Keça Tilîn dît go, "Ev çend rûhbereke bedew e wisa! Lap keçeke ku bibe bûka min!" Hema Keça Tilîn hilda û xwe avête nav bexçeyi.

Ji nav bexçe ra çemek derbaz dibû. Beq û kurê wê, di nav herîya ku li rexê çem da dijîyan. Kur, ji dayîka xwe jî kirêttir bû çawa Keça Tilîn dît, qîrya û bû "weq weqa!" wî.

Dîya wî gotê, "Deng û dorê neke! Dê keçikê şîyar kî! Te hind dît firî çû. Em wê danine nav zembaqên di çem da. Wê bizane ku di giravekî da ye, nikare bireve. Em jî dê di wê bêhnê da xaniyekê ji te ra serûber kin."

Di nîveka çemî da zembaq hebûn; belgên wan yên heşîn li ser avê diherikîn. Beqa sere, qelpika gûza ku Keça Tilîn tê da razay ragirt û ber bi belgê mezin ve melevanî kir.

Spêdê ji zû ve Keça Tilîn şîyar bû; dît ku di nava çem da di giravekê da ye, dest bi girînê kir.

Wê gavê, beqa sere di nav herîyê da ji kur û bûka xwe ra xaniyek ava dikir. Piştî karê xwe xilas kir, digel kurê xwe çû nik Keça Til. Gotê, "Ev e kurê min. Tu dê bi wî ra bizewicî. Hêvî dikim ku hûn dilşa bin."

Kurê wê yê kirêt jî hind karî ku go, "weq! weq! weq!"

Herdu beqa nivîna Keça Tilîn hilgirtin û vegerîn malê. Keça Tilîn li ser belgê zembaqê dest bi girînê kir. Çend dihate bîra wê ku dê digel beqê kirêt bizewice xema wê girantir dibû.

Di wê gavê da masîyên di çem da gotinên beqa sere bihîstibûn; serên xwe ji bin avê derxistin ku keçika piçûk bibînin. Çawa jî ew dîtin, pir xemgîn bûn; ev keçika bedew, dibe ku bi wî tişabetê kirêt ra bizewice?

"Nexêr! Divê em nehêlin!"

Çend masî di çem da hebûn hemû li dora belg kom bûn. Tayê zembaqê yê di nav avê da kohtin û belg jê qetandin.

Belgê dest bi melevanîya kir; Keça Tilîn bire cihekî wisa dûr ku beq negihê.

Keça Tilîn, ji gelek gundan derbaz bû. Dema çivîka ew didît diwîçîn û digotin, "Çi keçeke bedew e!" Belg her diherikî.

Dawîyê hatin welatekî dî. Sîsirkekê li ser serê keçikê xûya kir. Midehekê perên xwe çirpandin û paşê hat dada ser belgê. Pir ji Keça Tilîn hezkirî bû; ya rastî Keça Tilîn jî gelek jê hezkirî bû. Edî ye hêsa bû; ji beqa dûrketibû. Ev welatê nû jî pirî xweş bû. Tavê, tîrêjên zîvîn didane avê. Keça Tilîn kemera xwe ji piştî xwe vekir; kujîyeke wê bi belgê, kujîyê dî jî bi sîsirkê ve girêda. Edî hêltir diçûn.

Axir, kêzeke gulanê xûya bû li hindava serê wan. Çawa çav bi Keça Tilîn ket hema ji nişkê ve ji navtanga wê ya zirav ra girt bir danî ser darekê. Belg, diherikî li ser avê; ciku sîsirk girêdayî belgê bû, tiştê jî ji destê wê nedihat.

Keça Tilîn pir tirsabû! Ji bo sîsirkê jî xemgîn dibû. Xirabî li sîsirkê kiribû ku ew bi belgê ve girêdabû; heke ne filite wê ji bîrsa bimire.

Kêza gulanê qet ji tiştê xemgîn nedibû. Rûnişte tenişt Keça Tilîn û hingiv dayê; herçend ne temetî kêxên gulanê jî be lê dîsa bedewîtiya wê, gotê. Paşî çendekê ew kêzên gulanê yên li ser wê darê dijîyan hatin ku Keça Tilîn bibînin. Kêza gulanê ya mê, hûr hûr lê nêrî û got, "Kî dera vê bedew e! Tenê du lingên wê hene." Yeke dî bi deng go, "rastî jî gelege kirêt e!" Yeke dî jî go, "Navtanga wê ziravik e! Lap mîna mirovan e!"

Kêzên gulanê yên mê bi qîre-wîr gotin, "Kirêt! Kirêt!" Lê belê Keça Tilîn gelege bedew bû. Ew kêza gulanê y ku ew anîbû ser darê, ew jî wisa diramî; lê belê wekî hemû hevalên wê Keça Tilîn kirêt dîtin, êdî axiftin ji wê jî nehat.

Zivirî ser keçikê û gotê, "Tu bixwazî biçî kî derê, dikarî biçî."

Kêzên gulanê, Keça. Tilîn anîn xwarê û danîn ser beybûnekê. Keça Tilîn ji ber ku gotibûnê kirêt e, girîya. Heke rastî bête gotin, ew mîna belgeke gulê bedew bû.

Keça Tilîn havîn bi tenê derbaz kir li wî rêhlî. Ji gîya cihek ji xwe ra çêkir; ji ber baranê jî xwe di binê belgeke oncê da sitirand. Hingivê kulîlka xwar, spêdehîya jî xunava li ser belga vexwar. Axir zivistan hat... Zivistana sar û dirêj... Ew çivîkên diwîçîn firîn çûn; dara belgên xwe werandin; kulîlk çirmisîn. Ew belgê oncê ya mezin jî çirmisî, tenê tayê wê ma.

Keça Tilîn êdî pir dicemidî; libasê wê diryabû. Befirê dest bi barîne kir. Her libka befrê ku dikete ser, ew wekî dara nav avê da direcifand. Çiku bejna wê du santîm bû. Xwest xwe bi belgeke hişk rapêçe; lê belê belg jî, ji nîvekê derizî.



Gavek wêdatir zevîyeke genimşamî hebû. Genimşamî hemû hatibûn birîn, tenê tayên wan mabûn. Keça Tilîn ji wê zevîyê derbaz bû.

Tayên genimşamî mîna darên rêhleki mezin dihatin berçavê wê. Dawîyê hate mala mişkekî zevîya.

Mişk, di bin reyên kayê, di kunikekê da rûdinişt. Wisa nebêjin kunik, mezeleke rûniştinê û mezeleke xwarin çêkirinê jî hebû; serda jî germik bû.

Keyfa mişkê zevîya li cih bû; ji bo zivistana xwe, kujîyekî mezê bi libkên ceh tijî kiribû.

Keça Tilîn der quta û mistek ceh jê xwest. Ew du roj bû ku parîyek nekiribû devê xwe. Ewqas birsî bû ku wê ceh jî bixwara.

Mişkê zevîya heywanetekî qenc bû. Dilê wî bi keçikê ve ma. Gotê, "Rebenê! Were jor xwe germ bike, xwarinê digel min bixwe." Paşê gelek hej Keça Tilîn kir û jê ra got, "Tu dikarî vê zivistanê digel min derbaz bikî. Dê mezela paqij bikî, amana bişoy, çîroka ji min ra bêjî. Wekî guh didim çîroka ji xwe diborim."

Keça Tilîn ev yeke qebl kir. Karûbarê mişkê zevîya kir. Li ber jî zikê xwe têr dikir û xwe germ dikir.

Rojekê ji roja mişkê zevîya gotê, "Îro dê mêvanek bêtin.

Heftîyê rojekê tête seredanîya min. Gelekî dewlemend e. Maleke mezin, kurkekî reş û biriqî heye. Heke tu bi wî ra bizewicî dê bikevî nav xweşîyeke mezin. Lê çavên wî nabînin. Heke tu bixwazî bikevî dilê wî çîrokên herî xweş jê ra bêje."

Keça Tilîn têgihişt ku ew mêvanê têt koremişk e. Ya rastî qet nedianî hizra xwe ku wê bi wî ra bizewice.

Li ser vê axiftinê koremişk hat. Kurkê xwe yê reş berkiribû.

Mişkê zevîya devê xwe bire ber guhê Keça Tilîn û gotê, "Hem î zanaye, hem jî dewlemend e. Mala wî jî, bîst cara ji mala min mezintir e."

Koremişk jî rastî hem î dewlemend bû hem jî zana bû. Qet tav û kulîlk nedîtibûn, lê her behs ji wan dikir; serda jî bi

çavekî piçûk ji tav û kulîlka behs dikir. Xwest ku Keça Tilîn jê ra bistrê. Keça Tilîn jî çend stran dizanîn jê ra gotin. Dengê wê gelekî xweş bû. Dilê koremişki ketê; lê belê çiku gelekî qure bû qet dengê xwe jî neanî.

Hêj koremişk nehati, di navbera herdu mala da tûnêlek kolabû. Rê da mişkê zevîya û Keça Tilîn ku êdî di tûnêlê ra biçine mala wî.

Gote wan, "Di tûnêlê da çivîkeke mirî heye, nebe bitirsîn. Hêj tûkê wê neweryaye. Nikulê wê jî hêjî pê ve ye. Dibe ku nû mirî be."

Paşê darikekî verizî girte devê xwe; agir vêxist û kete pêşîya mişk û Keça Tilîn. Çûne cihê ku çivîk lê mirî. Koremişki, kunek li serban vekir.

Tavê, tûnêl ronkir. Niha li hemberî çivîka mirî bûn. Ser û pencên xwe li bin perên xwe yên delal veşartibûn. Dibe ku ji ber sermayê miribû. Keça Tilîn çiku gelek ji çivîka hez dikir, pir xemgîn bû. Timamî havînê guh dabû dengê çivîka.

Koremişki bi lingên xwe yên xwahr û vîç çivîk da alîyekê û go, "Êdî nikare biwîçe. Wek çivîkî hatina dinyayê çend bê talihî ye! Axir, zarokên min yek jî nabine çivîk. Çivîk ji wîçînê zêdetir nikarin tiştêkê bikin; dema zivistan jî têt dimirin."

Mişki bi dengêkî bilind go, "Tu çawa dibêjî wisa ne. Dema zivistan têt çi hewceyî wîçînê ye! Bi wîçînê nikare zikê xwe têr ke! Bi wîçînê xwe germ nake ku!"

Keça Tilîn qet tiştêk negot. Çawa mişkê zevîya û koremişki berê xwe dane alîyê dî, xwe çemand destê xwe bi tûkê çivîkê da anî, çavên wê maç kirin.

Got, "Dibe ku tu bûy, timamî havînê ji bo min wîçî. Tu çi xweşik diwîçay..."

Koremişki kuna ku di serban da vekirî girt; vegeirî mala mişkê zevîya.

Keça Tilîn wê şevê qet nikarî binive; rabû ji ka nermik lihêfek çêkir. Kulîlkek jî hilgirt çû nik çivîka mirî. Çivîk bi wê lihêfê peçinî.

Got, "Bi xêr biçî çivîka şirînok, bi xêr... Havînê tu çawa

xweşik diwîçay... Dar hemû şîn bibûn; tavê derûdor germ kiribû. "Çemya serê xwe danî ser singê çivîkê. Çawa jî danî veciniqî. Dilê çivîkê lêdida! Çivîk hêj nemiribû; ji sermayê qerisî bû; çawa bi lihêfê jî hatibû peçînîn germ bibû.

Dema payîz têt hemû çivîk koç dikine deverên germ. Yên li paş dimînin ji sermayê diqerisin û dikevin: Heke germîyekê nebînin dimirin diçin. Befir jî wan dipeçine.

Keça Tilîn tûsî tirseke mezin bû. Çivîk ye mezin bû. Lê dîlpêvemana wê tirsê wê şand. Serê çivîkê jî peçînî.

Şeva dî dîsa çû tûnêlê. Çivîk hêj dijîya. Lê gelege jar bû.. Çavekî xwe vekir û berê xwe da Keça Tilîn.

Go, "Spas dikim keçika piçûk. Ez germ bûm. Nêzîk da ez'ê bi serxwe ve bêm, derkevime ber tavê."

Keça Tilîn gotê. "Divê tu kêmekê bimînî. Derve gelekî sar e. Befir têt. Li vê derê bimîne. Ez'ê te xweyî bikim.

Bi belgeke kulîlkê av ji çivîkê ra bir. Piştî av vexwar çivîkê behsê sedemê paşmayîna xwe kir. Strîyek di pîyê wê da çikilî bû lewma nikaribû bifire û ketibû erdê. Êdî bê hiş mabû.

Timamî zivistanê, çivîk di tûnêlê da ma. Keça Tilîn ew xweyî kir. Behsê çivîkê ne ji mişkê zevîya ne jî ji koremişki ra nekir. Çiku herduyan jî ji çivîkê heznedikir.

Axir bihar hat. Tavê rûyê erdê dîsa germ kir. Çivîkê gote Keça Tilîn, "di nav xweşiyê da bimîne." Keça Tilîn kunikek di serban da vekir. Çivîkê gotê, "Were te jî bibim. Dê li piştî min siwar bî, ez'ê te bibim nik darên heşîn."

Keça Tilîn bo ku mişkê zevîya bi tenê nehêle go, "Nexêr, ez nikarim bêm."

Çivîkê go, "Başê, di nav xweşiyê da bimîne. Di nav xweşiyê da bimîne keçika piçûk." Paşê firî çû. Çavên Keça Tilîn tijî rondik bûn. Pir hej çivîka xweşik kiribû.

Keça Tilîn ji ber ku êdî nedikarî çavê rojê bibîne, gelege xemgîn bû. Genimşamîyên li hindava serê wan êdî mezin bibûn. Nedizanî ku dê çawa ji wê derê derkeve.

Rojekê mişkê zevîya gotê, "Tu dê bizewicî Keça Tilîn. Koremişk dixwaze digel te bizewice. Eve talihekî mezin e ji

bo keçeke mîna te reben! Dê ka cihêza xwe hazir bike. Libasê xwe yê bûkîn jî ji bîr neke."

Keça Tilîn dest bi dirûna libasê bûkînî kir. Mişkê zevîya çar mûrî jî anîn ku hevkarîya wê bikin. Bi şev û roj dixebitîn; koremişk herşev dihat û digot ku çawa havîn xilas be wê bizewicin.

Keçika piçûk ye dilşa nebû. Qet hej koremişki nedikir. Spêdehîya derdikete jor û ji nav gupîyên genimşamîya berê xwe dida mistek esman. Bêrîya çivîkê kiribû. Çivîka wê ya xweşdivî, li dûraya, di nav darên heşîn da bû.

Bi hatina payîzê libasê bûkîn yê Keça Tilîn jî xilas bû.

Mişkê zevîya gotê, "tu dê piştî mehekê şû bikî." Keça Tilîn dest bi girînê kir û bi qêrîn got, "ez naxwazim digel wî koremişki bizewicim."

Mişkê zevîya hêrs bû û gotê, "Devê xwe têk nede. B'aqil be, heke ez'ê te jêk bikim! Koremişk gelekî jêhatî ye! Ew kurkê wî li ser milê Keybana nîne! Serda jî maleke mezin jî heye. Heta tu spas bikî, çi d'axivî!..."

Dawîya dawîyê roja dawetê hat. Koremişk hat ber derî ku Keça Tilîn bibe. Rebenê, êdî dê di bin erdê da bijîya; êdî qet u qet çave rojê dê nedîta. Cara dawîyê xwest berê xwe bide esman.

Destên xwe vekirin û got, "Bi xêr bimîne, tava delal!" Genimşamî hatibûn birîn; çend gav di zevîyê da avêtin. Bi dengê bilind bangî kulîlka kir, "bi xêr bimînin, xweşdivîyên min ji çivîkê ra jî bihinêrin..."

Wê gavê dengê çivîkekê bihîst, çawa serê xwe rakir li esman çivîk dît. Çivîkê hema dada erdê. Keça Tilîn jê ra got ku êdî dê bi koremişk ra bizewice û dê di bin erdê da bijî û êdî çavê rojê jî nabîne. Dest bi girînê kir.

Çivîkê gotê, "Zivistan têt. Ez diçime deverên germ. Tu jî bi min ra were. Rûne ser piştî min, piştbenka xwe jî bi stûyê min ve girêde. Tu dê ji wî koremişkê kirêt xilas bî. Em'ê biçine deverên germ nav kulîlkên delal... Bi min ra were Keça Tilîn. Min ji bîr nekirîye ku te ez xilas kiribûm."

Keça Tilîn go, "bila". Rûnişte ser pişta çivîkê û piştbenka xwe avête stûyê wê. Çivîk firî. Di ser rêhla, gola, ji ser girên ku mayne di bin befrê da derbaz bûn. Keça Tilîn cemidî; bo ku germ bibe xwe veşarte nav tûkê çivîkê. Carna serê xwe derdixist û berê xwe dida jêr.

Dawîyê hatin deverên germ. Tavê derûdor wisa germ kiribû. Li ser rîya kulîlkên renga reng vekiribûn. Zarok di nav daran da bi sîsîrka ra dileyizîn.

Axir qesreke şîn xûya bû di bin wan da. Di lêva golê da qesreke ji mermerê spî hebû. Ev avahîyekî kevin bû; li ser ew stûnên ku bi daralînka ve rapêçbûy hêlînên çivîka hebûn. Hêlîna çivîka ku Keça Tilîn anî jî li wê derê bû.

Çivîkê go, "aha ev e hêlîna min. Lê belê tu li wê derê nanînî; ez te daynim ser kulîlkeke bedew ji van."

Keça Tilîn go, "spas dikim." Destên xwe yên nermik bi keyf li hev xistin.

Li erdê stûneke ku bûye sê parçe dîtîn. Li rexê stûnê kulîlkên herî bedew vekiribûn. Çivîkê Keça Tilîn danî ser belgên wê kulîlkê.

Keça Tilîn, di nîveka kulîlkê da xortekî piçûk dît. Di serê wî da tacek û bi milên wî ve jî per hebûn. Bejna wî temetî Keça Tilîn bû. Meçêtirekî kulîlka bû. Di her kulîlkê da cotek meçêtir dijîyan. Ev meçêtir jî, Keyê hemû meçêtirên kulîlka bû.

Keça Tilîn bi dengê nîzim gote çivîkê, "Ev xorte çendî jêhatî ye."

Dema Keyê meçêtirên kulîlka çivîk dîtî gelek tirsabû. Lê ji Keça Tilîn ra jî dilborî bû. Heta wê rojê keçeke wisa bedew nedîtibû. Tacê xwe derxist û danî ser serê Keça Tilîn; gotê ku pê ra bizewice û bibe Keybana kulîlka.

Meçêtirê kulîlka ne wekî kurê beqê ne jî mîna koremişki bû; lewma jî Keça Tilîn qebûl kir ku pê ra bizewice. Di wê gavê da belgên hemû kulîlka vebûn û bi sedan meçêtir ji nav derketin. Hemû jî çend bedew bûn!

Ji Keça Tilîn ra dîyarî anîn. Ji nav wan yekî jî cotek per


danê. Edî Keça Tilîn wê ji kulîlkekê heta kulîlkeke dî bifirya.

Dawetek nedîtî pêkhat. Çivîkekî piçûk jî dirêj dirêj wîçî; hindî ku dizanî stra. Ya rastî piçekê î xemgîn bû; çiku ew jî hezkirîyê Keça Tilîn bû.

Keyê meçêtirên kulîlka gote Keça Tilîn, "Edî em ji te ra nabêjin Keça Tilîn. Ev nave gelekî kirêt e. Tu jî hind bedewî ku... Ji îro pê ve bila navê te Maya be."

Çivîkê go, "bi xêr bimînin." Wisa xemgîn firî çû deverekî dî. Dada pencera çîrokbêjekê û ev çîrok jê ra got.

Me jî ev çîroke ji wî çîrokbêji bihîst.





Leşkerê Risas Yê Egit

Demek ji dema bîst û pênc leşkerên risas hebûn; ji ber ku ji yek gumtîlî hatibûn çêkirin, hemû jî bira bûn. Di milên wan da tîfek, unîforma şîn-sor û birîqî li ber, mîna tayekê bûn. Di dinya xwe ya nû da qîsa pêşîn ku bihîstine çi bûye hûn dizanin? Dema qepaxê gotîya ku ew tê da nivîstî vebûy, zarokê piçûk destên xwe çirpandine û bi qêrîn gotîye "Leşkeran! Leşkeran!" Cara pêşîn aha ev qîse bihîstibûn.

Roja bûyîna zarokî bû; leşkerên risas jî wek dîyarîya vê rojê dabûne wî. Zarokî jî demildest hemû li ser masê rêz kiribûn. Leşker hemû mîna hev bûn; lê ji nav wan yek bi lingekê bû. Çiku ew dûmahîkê hatibû çêkirin; risas xilas bibû lewma ew bi lingekê mabû.

Dîsa lingekê têra dîkir, ew jî wekî birayên xwe dîkarî li ser piya raweste. Ya rastî jî, di nav bîst û pênc bira da ew'ê bibûya yê herî navdar.

Leyizokên dî jî hebûn li ser masê; lê yê cara pêşîn ber bi çav diket, qesreke ji kartonê bû. Ji pencerekên piçûk nava hemû mezela dihate dîtin. Li pêşberê dar hatibûn bi cih kirin

û bo ku şûna golê bigre neynikeke piçûk ji hatibû danîn. Li ser neynikê kuxuyên ji şema hingiv, melevani dikirin. Hemû jî gelekî delal bûn rastî; lê ji nav wan ya herî bedew, keçika piçûk ya ku li ber derê vekirî yê qesrê bû.

Ew jî ji kaxezê bû; libasekî tenikî ji tûl berkiribû, guleke biriqokî bi serê xwe ve vekiribû, kurdêleyeke şîn jî avêtibû ser milên xwe. Balerîn bû. Her du milên xwe berepaş dirêj kiribûn, lingekî xwe jî berepaş avêtibû û bilind kiribû. Leşkerê risas wisa zanî ku ew jî wekî wî bi yek lingî ye.

Hizirî go, "Aha, lap keçeke li gor min e. Wekî ez bi wê ra bizewicîma wê çend baş bûya; em'ê çawa ji hev bihatina! Lê li kîderêê? Ew li qesrê dijî; ez jî di qotîyê da rûdinim. Serda jî qotîyeke ku bîst û pênc kes tê da ne!

Nexêr, ez nikarim wê wek bûk bînime vê qotîyê. Ya qenc, ez dîsa rîyekê bibînim ku digel wê nasyar bim.

Paşê, li paş qotîyeke birnûtê ya li ser masê kete çeper. Hûr hûr li wê keçika wisa çik li ser lingekê rawestay, nêrî.

Çawa bu şev, leşkerên risas rakirine ser qotîyên wan; yên li mal jî çûne ser cihên xwe. Saeta leyiza leyizoka jî hatibû êdî. Malişkanê dileyistin, mêvan radigirtin, bi yarî şer dikirin. Leşkerên risas jî xwestin tevî van leyiza bibin; lê belê nedikarîn qepaxên qotîya vekin û derkevin.

Findeqşikêra qulopinc avêtin; qelemê risas jî li ser kaxeza ber destê xwe da hin tişt xîç kirin. Ewqas dengûdor kirin ku kanarya di rikehê da hişyar bû û wîçî. Rastî mîna helbestê diwîçya. Yên ku di nav wan da nedilivîn leşkerê risas û balerîn bûn. Balerîn li ser tilên pîyê xwe disekinî û milên xwe vekiribûn. Leşkerê risas jî li ser pîyekî xwe bû û çavên xwe gavekê jî ji ser balerînê dûrnedikirin.

Axir saetê li dozdehê xist; qepaxê qotîya birnûtê kir teq û vebû. Lê belê qet birnût tê da nebû; li şûna birnûtê meçêtirekî piçûçik û reş hebû.

Meçêtiri gote leşkerê risas, "Leşkerê risas, wekî dê berê xwe bidîye cihekî dî li xwe binêre!"

Leşkerê risas qet xwe bi ser ve nebîr.

Meçêtiri go, "Heke bû spêde tu dê bibînî."

Spêdê wekî zarok rabûn, leşkerê risas danîn ber pencerê; pencere jî ca an ji ber meçêtir an jî ji ber ba, ji nişkê ve hate girtin. Leşkerê risas jî ji tebeqa sêyem ser û ser bi erdê ket. Lingekî wî li hewa, kete navbera du kevirên rexê rê.

Xidam û zarokê piçûk bi lez bezîne xwarê, li leşkerê risas geryan. Kêm mabû ku pê lê kin. Heke leşkerê risas "Hawar!" bixwesta wê ew bidîtina. Çiku bi unîforma bû li xwe negirt ku hawarê bixwaze. Xidam û zarokê piçûk jî ew nedîtin.

Paşî çendekê baranê dest bi barînê kir; hertişt bi ber lehîyê ket. Çawa baran rawesta, du zarokên beraday hatin. Yekî go, "Ka binêre vî leşkerê risas! Dê ka em wî bidine melevanîya."

Kelekek ji kaxeza rojnamê çêkirin, leşkerê risas jî danîne nav. Paşê kelek berdane avê. Av wekî çema fûrya bû û kelek rakêşa. Zarok bi çepika qederekê digel kelekê ber avê da bezîn. Leşkerê risas piçekê tirsas, lê qet diyar nekir. Tifek li milê wî, çik sekinî bû û li pêşîya xwe dinêrî. Nişkê da hind dît ku di tûnêleke mîna sîpê da ye; tûnêl jî wekî qotîyê tarî bû.

Hizirî û go, "Ez diçime kî derê? Eve hemû ji bin serê wî meçêtirî derketin.

Ax, xwezî ew keç niha li nik min bûya... Hingê bila hêj tarîtir bûya, min qet guh nedidayê."

Wê gavê mişkekî avî yê ku di tûnêlê da dijiya xwe nêzîkî leşkerê risas kir.

Gotê, "kaxeza te ya derbaz bûnê heye? Ka ez bibînim."

Leşkerê risas bersiv neda; tifeka xwe zevttir girt. Kelek wisa hêl derbaz bû çû. Mişkê avî didanên xwe çirikandin, bi dûvda bezî û bi qêrîn go, "Bigrin! Kaxeza xwe ya derbazbûnê nîşanî min neda!"

Av her diçû zêde dibû. Leşkerê risas êdî ronahîya rojê di dawîya tûnêlê da didît. Paşê gumînek bihîst ku dilê yên herî bi cesaret jî wê bitirsanda. Hema serra gihişt ku di dawîya tûnêlê da av diherike coyeke mezin. Îmkana sekinînê nebû. Kelek bi hêl ketibû. Leşkerê risas qet nelivî; çavê xwe jî qet neniqand.

Kelek, li dor xwe sê-çar cara zivirî. Av tijî bû. Binav dibû. Leşkerê risas heta gewrîyê binav bû. Hizra balerînê kir ku êdî dê ew qet nedîta. Sirûda jê gelek hezdkir hate bîra wî:

"Ber bi pêş! Ber bi pêş! Her ber bi pêş!
Mirin naçemîne leşkerê risas!"

Keleka kaxez bi timamî vebû. Leşkerê risas nuqî avê bû. Çawa binav bû, masîyekî mezin ji nişkê ve ew daqurçand.

Ax, zikê masî çendî tarî bû! Çavi çav nedidît. Ji tûnêlê jî xiraptir bû. Serda jî î teng bû! Lê leşkerê risas î egît bû, mûyê xwe jî nelivand, tîfek li milê wî xwe dirêjî nav zikê masî kir.

Masî nişkê da vepirpidî. Paşî demekê vezelî. Paşê zikê wî hat qelaştin; leşkerê risas carkê da xwe di ronahîyê da dît. Dengê hat go, "Aa, leşkerekî risas!" Tu ne bêje masî hatiye girtinê, li çarsûyê jî hatiye firotinê û ji wê derê jî birine medbexekê. Medbexvani zikê wî bi kêrikeke mezin ker kiribû.

Bi serê du tilên xwe leşkerê risas hilgirt û bire mezela runiştinê nîşanî hemûyan da. Çi leşkerekî egît bû! Bê tirs di zikê masîyekê da rêvingî kiribû. Lê belê, leşkerê risas gelekî dîlnizm bû, qet xwe qubûr nekir. Ew danîn ser masê... Aha tam di wê gavê da leşkerê risas kir ku zimanê xwe daqurçe.

Di mezela xwe ya kevin da bû! Her ew zarok, ew leyizok. Ew qesra karton û ew balerîna bedew dît.

Balerîn dîsa li ser pîyekê disekinî. Dîyar bû ku wê jî xwe bernedabû! Heke leşkerê risas xwe negirta wê lûr lûr bigirîya... ewqas dîlnazik bû! Berê xwe da Balerînê. Balerînê jî berê xwe da wî. Paşê, ji zarokên piçûk yekî nişkê da leşkerê risas girt û avête nav agir. Hetmen eve jî ji bin serê wî meçêtirê di qotîya birnûtê da derketibû! Leşkerê risas xwe di nav agir da dît. Ca an ji ber germa agir bû an jî ji ber germa evîna dilê wî bû, xwûh da. Ew rengê wî yê delal beqem bû. Belkî jî ji ber janê beqem bibû.

Dîsa berê xwe da balerînê, balerînê jî berê xwe da wî. Leşkerê risas dihelîya; lê wekî dihelîya jî dîsa tifeke xwe bernedida.

Ji nişkê ve dergeh vebû wê gavê. Bayê hatî, balerîna piçûk rakêşa ser agir. Balerîn li rex leşkerê risas agir vêket û carkê da bû xwelî.

Spêdehîya dî xidamê dît ku leşkerê risas helîyaye û wekî dilekê lêhatîye. Li paş balerînê jî gula wê ya reş-tarî mîna rejûyê mabû.





Bilbil

Qesra Împaratorê Çîn'ê, bedewtirîn qesir bû di dinyayê da. Ji porselenê tenik hatibû çêkirin; wekî mirov destê xwe lêbida, divîya pir haj xwe bûya, heke wê tik û bişkesta.

Di bexçe da kulîlkên bijare hebûn; zengilokên zîv, bi yên herî delal ve kiribûn, daku yên ji rê derbaz dibin guh li zengiloka bibin û berê xwe bidinê... Belê! Di rûyê erdê da bexçeyekî wekî bexçeyê Împaratorî nebû; serda jî ewqasî mezin bû ku bexçevanî jî her derê wî nedizanî. Di xilasîya bexçe da kozikeke spehî, ji kozikê wêdatir jî derya hebû. Darên bilind, heta ber derya şîn û kûr rêz dibûn; wisa ku keştîyên mezin di bin çeqên wan da diçûn.

Li ser wan çeqa bilbilek dijîya; bilbili dengêkî wisa şîrîn hebû ku, masîvanên hejar jî wekî bi şevê dihatin bi torê masîya bigrin, karûbarê xwe berdidan û guh didan xwendina bilbili.

Ji heft deverên dinyayê gervan dihatine vê derê. Hemûyan jî ji serbajêr, qesr û ji bexçeyî pir hezdikir; lê belê çawa guh

didan dengê bilbil digotin "Aha, tiştê herî delal ev e." Dema dizivirîn welatên xwe timam ji behs kirina bilbil têrnedibûn. Ew zanayên li ser serbajêr, qesr û bexçeyî pirtûk dinvîsîn, zêdetir methê bilbili dikirin. Helbestên herî xweşik û navdar yên helbestvana li ser wî bilbilê di kozika hindava derya da bûn.

Yek ji wan pirtûka talîyê ghişte destê Împarator. Împaratorî dest bi xwendina pirtûkê kir; her ku dixwend serê xwe jî dihejand; metihdana serbajêr, qesr û bexçe pir lê xweş hatibû. Lê ev hevoka di dawîya rûpela da hatîye nivîsîn "Di nav van da ya herî bedew bilbil e" ew şaş kir.

Hizirî go. "Eve anku çi? Bilbil! Qet hayê min ji bilbilekî wisa jî nîne. Serda jî di welatê min û bexçê min da diji! Mirov ji pirtûka çend tišta fêrdibe."

Serokwezîr da gazîkirin. Serokwezîr, mirovekî pir qure bû; kesê nedikarî wisa bi hêsanî pê ra baxive. Bersiva wî li hember hemû pirsas bes "Pif!" bû. Ya rastî hûn bivên, qet me'na vê "Pif"ê jî nebû.

Împarator gotê, "Li vê derê bilbilek hebûye. Ruhberê herî bi qîmet yê welatê min bûye. Bo çi, we qet behsê wî ji min ra nekir heta îro?"

Serokwezîr bersiv da go, "Ez wî nasnakim ku. Qet nehatîye qesrê."

Împaratori go, "Îşev wî bînin. Tiştê ecêb e, ji bilî min her kes ji bilbili agahdar e!"

Serokwezîr go, "Min qet ew nedîtîye. Ez'ê biçim lê bigerim." Lê belê nedizanî ka wê bilbili li kî derê peyda bike. Li hemû mezelên qesrê gerîya, ji her kesê pirsî. Haya kesê ji bilbilî nebû. Serokwezîr jî çû nik Împarator gotê, "Kes bilbilî nas nake. Nivîskarê pirtûkê ji ber xwe avêtîye. Ne rast e ku mirov ji nivîsarên pirtûka bawer bike. Nivîskar hemû derewker in."

Împaratorî go, "Ew pirtûk Împaratorê mezin yê Japon ji min ra hinartîye. Nabe derew be. Ez îşev bilbilî dixwazim. Heke tu neynî, kî di qesrê da heye ez'ê bidime qutan."

Serokwezîr tûşî tirseke mezin bû. Dîsa li mezela gerîya û pîrsa bilbili kir. Her kes li qesrê li bilbilî digerîya; çiku di serê vî karî da qutan hebû. Lê belê, ew tiştê hemû dinyayê dizanî esilzadeyên di nav çar dîwarê qesrê da nedizanîn.

Talîyê rastî keçeke piçûke reben hatin li medbexê. Keçikê bi dengê bilind go, "Bilbil? Ez cihê wî dizanim. Wisa xweşik dixwîne ku! Herşev bermayê xwarinê ez ji dayîka xwe ra dibim malê. Dîya min li qeraxê derya rûdine. Dema vedigerim, li kozikê hinekê xwe mijûl dikim û guh didime bilbil. Wekî guh didime wî, her rondik ji çavên min tîn!"

Serokwezîr gotê; "Keça min, heke tu me bibî nik bilbil ez'ê hevkarîyeke mezin li te bikim. Herşev dema Împarator xwarinê dixwe ez'ê destûrê bidime te ku tu bîy wî bibînî. Divê em bilbilî bînine qesrê."

Ber bi kozika ku bilbil lê dixwîne çûn. Nîva kesên ku di qesrê da dijîn bi dûv keçikê ketibûn. Wekî bi rê ve diçûn, ji dûr ve çêlekekê dest bi orînê kir.

Ji esilzadeya yek qîrya go, "Aha va ye!

Bilbil dixwîne! Çi dengê delal heye! Ji çivîkeke piçûk dengê wisa derkeve tiştê ecêb e!"

Keçikê go, "Nexêr, evê dengê çêlekekê ye. Hêj gelek maye heta ku em bigihine cihê bilbil lê."

Piçek dî ji çûn, dengê weq weqa beqa di nav avê da bihîstin.

Ji wezîran yekî go, "Timam! Bilbil dixwîne!"

Keçika piçûk go, "Eve dengê beqê ye. Piştî çendekî dî em'ê bigihine nik bilbili."

Axir dengê bilbil hat guhê wan.

Keçika piçûk bi dengê bilind go, "Guh bidin! Ca guh bidinê! Çi spehî dixwîne!"

Paşê, çivîka piçûk ya li ser çeqê darê nîşa da.

Serokwezîr wekî çivîk dît wisa şaş bû. Go, "Çi ecêb! Ji vî rûhberê reng xwelîkî ew deng çawa derdikeve? Dibe ku çawa em ev kesên bijare dîtin paşê rengê wî beqem bû."

Keçika piçûk bang lê kir gotê, "Bilbilê delal, Împaratorê me yê mezin dixwaze guh bide te."

Bilbili go, "Ez ji vê yekê wê serbilind bim" ; dest bi xwendinê kir. Wisa delal dixwend ku, ew kesên li wê derê hemû efsûnî bûn.

Serokwezîr bi dengekî nizim go, "Mîna zengilokên cam deng jê derdikeve. Berê xwe bidine gewrîya wî, çawa dilive! Em li kî derê bûne heta îro? Zimanê hemû kesên di qesrê da dê ji vê ecêbê lal bibe."

Bilbili pirsî, "Gelo, Împarator dê carkî dî jî guh bide min?" Wî Împarator li kî derê dizanî ku.

Serokwezîr gotê, "Bilbilê bi rêz û qîmet. Ez te îşev gazî qesrê dikim, sahîyeke mezin heye, Împarator bi bihîstina dengê te wê gelekî şa be."

Bilbili go, "Dengê min di nav darên heşîn da xweşiktir derdikeve." Lê ji ber ku Împarator gazî wî kiribû, çûna qesrê qebûl kir.

Di nîveka mezela qesrê ya mezin da cigehekî ji zêr jê ra danîn. Esilzade hemû bi cih bûn; destûra keçika piçûk jî dan ku li pişt derî bisekine. Herkesê libasên xwe yên bedew berkiribûn; çav hemû li ser çivîkê reng xwelîkî bûn. Împarator bi serê xwe îşaret da bilbili.

Bilbili wisa xweşîk xwend ku, çavên Împarator tijî bûn, rondik bi alekê da hatin xwar. Ewên ku li wê derê hemû wisa dîlnazîkî bûn.

Împaratori xwest ku şimikên xwe yên zêr bide bilbili. Bilbili spas kir go, "Min rondik di çavê Împarator da dîtin. Dîyarîya herî mezin ew in ji min ra. Qîmetekî cûda heye wan rondika. Min tişteki dî nevêt; ev serbilindîye besî min e."

Paşê dîsa dest bi xwendinê kir.

Jinên esilzade yên guh dayne bilbil gotin, "Me dengekî wisa delal nebihîstibû." Wê şevê devên xwe tijî av kirin; kirne xerxere û xwestin 'bixwînin'.

Herkes di qesrê da dilborîyê bilbil bibû. Rikeheke xweser

jê ra hazir kirin. Ew çivîkê bê hevta, êdî dê di rikehê da bima; bi roj du cara, şevê jî carekê destûra firîna wî dabûn. Berî firîna wî pîyên wî bi kurdêla armîş girêdidan, serê kurdêlê jî dozdeh xulama digirt. Ya rastî çu tama firîna bi vî tehrî jî nebû.

Axiftina serbajêr pêk ve li ser bilbili bû. Heke du çivîk li kolanê rastî hev bihatina yekê digot 'bil' ya dî jî digo 'bil'. Tişteke dî jî nedigotin. Tenê axîr dikşandin. Navê bilbil dane yazdeh zarokên nû bûy; lê neku xwendin, girînek delal jî ji zaroka nehat.

Rojek ji roja pakêteke mezin ji Împarator ra anîn. Li ser pakête "Bilbil" hatibû nivîsîn.

Împaratori go, "Dibe ku pirtûkeke dî ye li ser bilbilê me hatiye nivîsîn." Lê ji pakête pirtûk derneket, bilbilekî bi dest çêkirî jê derket. Eve leyizokeke wisa delal bû, mîna bilbilê rastîn bû; bi gumtilên qîmet ve, bi yaquta, elmasa, zûmrûta hatibû neqîşandin. Wekî zembereka wê bardikirin, mîna bilbilê rastîn dixwend û di vê navberê da kurîya xwe jî dihejand.

Hemûya ji bilbilê leyizok hez kir. Mehane dane yê ku pakêta anî wekî bi navdarîya "Serokbilbilvanê Qesrê".

Împaratori xwest ku bilbilê rastîn û leyizok pêk ve bixwînin. Eve serkevtî nebû; bilbilê rastîn ji dîl dixwend, lê bilbilê leyizok çawa barkiribûn wisa deng derdixist.

Mamostê mûzîkê go, "Ne sûcê wî ye. Çawa hatiye barkirin wisa dixwîne. Ji ser noteyekê jî baznade; li gor hemû qaydên mûzîkê dixwîne."

Piştî axiftina mamostê mûzîkê, bilbilê leyizok bi serê xwe xwend. Her wekî bilbilê rastîn serkevtî dixwend; serda jî spehîtir bû, tûkê wî bi gumtilên qîmet ve wisa dibiriqî.

Yek miqam sih û sê cara dubare kir; dîsa ve newesta. Herkesê dixwest heta spêdê guhdarîya wî bike. Lê belê wê gavê Împarator ferman kir ku bilbilê rastîn jî piçekê bixwîne. Bilbilê rastîn xûya nedikir. Kesê tê dernexistibû ku wî ji pencera vekirî firdaye çûye kozika xwe ya heşîn.

Împarator veqîrya, "Eve dibe çi?" Kî li wê derê hebû, hemûya tahn li bilbil dan, ew bi nankorî sûcdar kirin. Gotin, "Başê ku me bilbilekî dî heye." Her yek miqam sih û çar cara guhdarî kirin. Eve pir miqameke têkilav bû; bi çu newla nedikarîn ji ber bikin. Lê belê mamostê mûzîkê got ku bilbilê leyizok qat bi qat ji bilbilê rastîn bi qîmettir e.

Go, "Mirov nikare jê derêxe ka bilbilê rastîn wê çawa bixwîne. Hindî bilbilê leyizoke qet xwe şaş nake û yek miqamî dubare dike. Heke hûn bixwazin ez'ê zembereka wî jê bikim û dîsa pê ve bikim. Hûn'ê bibînin çawa yek miqamî dubare dike."

Destûr hate dan ku mamostê mûzîkê yekşemba dî bilbilê leyizok nîşanî xelkê bide.

Împaratori go, "Bila herkes guh bidetê."

Guhdaran ji dengê bilbilê leyizok hezkirin; lê belê taybetî masîvan wisa hizirîn; "Xweş dixwîne; lê dîsa bilbilê rastîn çêtir bû."

Bilbilê rastîn, ji welat hat dûr kirin.

Bilbilê leyizok têkirne nîveka gumtilên bi qîmet û danîne ser mîndereke armîş ya li rex cihê Împarator. Împarator ew kire 'serekbilbil'.

Mamostê mûzîkê li ser bilbilê leyizok bîst û pênc cild pirtûk nivîsîn; di wan da bêjeyên herî dirêj û zehmet yên zimanê Çînî bi kar anîn. Herkesî jî, bo ku ehmeq neyên zanîn digotin ku pir baş di pirtûkê digihin û jê hezdikin.

Salek borî. Êdî Împaratori jî, yên di qesrê da jî stranên bilbilê leyizok ji ber kiribûn. Ji ber vê çendê pirtir ji bilbilê leyizok hezdikirin çiku wan jî dikarî strana digel wî bibêjin. Heta Împarator jî wekî, "Zîzî, zîzî, çeç, çeç, çeç!" dixwend.

Şevêkê wekî Împarator di cihê xwe da razay û guh dida bilbili, zembereka çivîkê nişkê da xirab bû. Stran di nivê da qut bû.

Împarator ji cihê xwe hilfirî gazî serekhekîm kir; helbet tiştek ji destê serekhekîm nedihat. Li ser vê yekê sereksaetçêker hat anîn. Saetçêker dirêj dirêj pê ve mijûl bû, talîyê çêkir; lê

got ku divê li ser hev neyê xebitandin. Heke wisa hercar bê xebitandin dê vîdên wî sist bûna; ji bo lêxistina vîdên nû jî ji xirabkirina mûzîkê pêvetir rê nebû.

Hemû ji vê yekê xemgîn bûn; êdî salê carekê bilbilê leyizok hate xebitandin. Mamostê mûzîkê hêj li ser rîka xwe bû ku bilbilê leyizok ji yê rastîn çêtir e; kesê jî di xwe ra nedidît ku li hember wî derkeve.

Piştî pênc sala Împarator tûşî nexweşîyeke giran bû; êdî digotin ku rojên wî hejmartî ne. Biryar hate dan ku kî wê li cihê wî rûne. Yên li kolana rastî serokwezîr dihatin, pîrsa sax-silametîya Împaratori dikirin.

Serokwezîr her wekî berê digot, "Pif!"

Împarator di cihê xwe da mîna mirîya radîza; yên di qesrê da, dibizivîn ku xwe li ber çavê esilzadeyê ku cihê Împarator bigre şîrîn bikin.

Lê Împarator hêj nemiribû. Bi sed kutekî bêhn hildigirt; giranîyek li ser singê wî hebû. Çawa çavên xwe vekirin, mirin dît. Mirinê tacê Împarator kiribû serê xwe, şûrekî zêr kiribû destê xwe, bi destê xwe yê dî jî alayek hilgirtibû. Ji qurmiçkên alayê dêmrûyên ecêb li Împaratorî dinêrîn; hindek jî wan gelek kirêt, hindek jî wan jî bedew bûn. Eve qencî û xirabîyên Împarator bûn. Niha hatibûn ku wî berpirs bikin. Bê rawestan diaxiftin.

Împarator ji nişkê ve di nav xwûn-xwuhê da ma.

Bi qêrîn go, "Mûzîk! Mûzîk! Çivîkê delal lava dikim piçekê bixwîne! Min gumtilên xwe yên herî spehî û bi qîmet dane te; şimikên xwe yên zêr jî min dîyarî te kirin... Piçekê bixwîne!"

Çivîki nexwend. Kesekî ku wî barbike li wan dera nebû. Mirinê bi çavên vala li Împarator dinêrî!

Ji nişkê ve ji derve, ji ber pencerê dengê şîrîn hat bihîstin. Eve bilbilê rastîn bû; dadabû ser çeçekê û dixwend. Nesaxîya Împarator bihîstibû û xwestibû jê ra hêvîyê bîne.

Ew dêmrûyên di nav qurmiçkên alayê da çawa dengê bilbili bihîstin beqem bûn. Xwûna di rehên Împarator da niha hêltir



diherikî. Mirinê jî guh da dengê bilbili; qîrya go, "Bixwîne bilbilê piçûk, bixwîne!"

Çivîkê jê pirsî, "Heke ez bixwînim dê şûrê zêr bidîye min? Alayê bidî? Tacê Împarator bidî?"

Mirinê hemû danê. Bilbili xwend. Behsê gulên spî, leylanên ku bêhna wan bê hevta, mêrgên bi rondikên çavan xwûs girtî û xemilî kir. Mirin wisa dîlnazikî bû ku, nişkê da bêrya bexçê xwe kir û mîna siyeke spî ji pencerê firî çû.

Împaratori go, "spas dikim çivîkê piçûk. Min tu ji welatê xwe dûrxistî lê te mirin ji ber serê min dûrxist. Ez'ê çawa heqê te razî bikim?"

Bilbili gotê, "Te razî kir. Min rondik dîtin di çavên te da. Ew rondik bo min ji elmasa, zûmrûta, yaquta jî bi qîmettirin. Niha binivin, hêsabin..."

Paşê dîsa dest bi xwendinê kir. Împarator kete xeweke kûr û şîrîn.

Wekî şîyar bûy, tav li esman dibiriqî. Qet xulamek jî nedixûya, hemûya wisa dizanîn ku Împarator mirîye.

Lê bilbili hêj li ber serê wî dixwend.

Împaratori gotê, "Her li nik min bimîne. Kengî tu bixwazî hingê bixwîne. Ez'ê bilbilê leyizok bişkênim."

Bilbili gotê, "Nexêr, ya ji dest hatî wî kir. Sûcekî wî nîne ku... Ez diçim; carna ez'ê bêm û bixwînim. Te şa bikim. Ez'ê xweşî û nexweşîyên dinyayê bînime ziman. Ez'ê behsê xirabîyên ku xwe ji te vedişartin, mirovên ku te nedizanîn, masîvana û gundîya bikim. Ez hej tacê te nakim, hej dilê te dikim. Ez'ê bizivirim. Lê ez dixwazim tu di tiştêkê da sozê bidîye min."



Împaratori go, "Bila". Lap mîna Împaratorekî disekinî vê gavê; şûrê xwe yê zêr li ser singê xwe givaştibû.

Bilbili gotê, "Ev tiştên ku min ji te ra behs kirî divê tu nebêjîye kesê ku te ji çivîkekî piçûk bihîstine."

Bilbil firî çû.

Esilzadeyên qesrê hatin ku meytê Împarator rakin; Împarator bi devkenî li wan nêrî û got, "Roj baş!"

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

XEWDA

PRENSES A RASTIN

KEÇA TILIN

LEŞKERE RISAS YE EĞET

BILBIL

Institut kurde de Paris

Institut Kurde de Paris



IKPLIV107752